



SILAVA

KOVARA YEKÎTIYA JINÊN CIWAN



HEJMARA YEKÊMÎN
A SALA 2025



*“Bi Tekoşîna Jinên Ciwan Emê Dagirkeriyê
Tekbibin, Suriyekê Demokratîk Ava Bikin”*

JI EDITÖR...

Em hejmara yekemîn a Kovara Silava di sala 2025 pêşkêşî we dikin. Wek hûn jî dizanin di 27'ê Mijdarê 2024 de dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wî êrîşkê berfireh li ser herêmên Bakûr û Rojhilatê Sûriyê dan destpêkirin. Piştî vê êrîşên xwe li dijî Şoreşa Gelan dewam kirin û niha di eniya Pira Qereqozaxê û Bendava Tişrînê de şervanên azadiyê destan pey destan dinivînin.

Çareseriyekê demokratîk ji bo welatên Rojhilata Navîn li ser esasê pergala Netewa Demokratîk ava dibe. Emê di vê hejmara Kovarê xwe de vê mijarê bigrin dest. Çareserî ji bo Rojhilata Navîn çi ye? Em dikarin pirsgirekên heyî çawa çareser bikin û li ser esasê azadiya jin pêşarokê nû ji bo gelê Rojhilata Navîn çawa misoger bikin? Di perspektîfa Rêber APO de wateya nasnameya gelan û girîngiya çareseriyekê demokratîk hatiye dest girtin. Her wiha di beşa Jineolojî Ciwan de mijara pergala Konfederalîzma Jin hatiye destgirtin. Ji bo em karibin çareseriyên Rêber APO fêm bikin, pêwîste em wateya "Demokrasî" jî fêm bikin. Ev peyv tê çî wate û di kûrahiya xwe digihişe kudere, emê bidin nasîn. Her wiha emê di beşa dîrokê de yek ji cihên herî kevnar ên Bakûr û Rojhilatê Sûriyê bidin nasîn. Hûn dikarin di vê beşê de nas bikin, çawa Til Berak dibe dergûşa Netewa Demokratîk. Herî dawî jî em behsa destana zindî ya ku em niha tê de dijîn ji we re behs bikin.

Dema em behsa Çareseriyaya Rojhilata Navîn dikin, em dikarin bêjin ku yekemîn cihê ku niha ev çareserî dixê meriyetê û her diçe berfirehtir dike Bakûr û Rojhilatê Sûriyê ye. Şervanên gelan li Tişrînê ji bo parastina çareseriyaya demokratîk şer dikin. Em niha vê destanê kêlî bi kêlî dişopînin. Li ser vê esasê em hevî dikin ku em dikarin bi vê hejmarê re hin zêdetir we nêzî fikrên Rêber APO bikin û bi xwendina vê kovarê xeta me ya çareseriyaya Rojhilata Navîn bidin fêmkirin.

RÊBERTÎ NAS BIKIN BI RÊBERTÎ BIJÎN

NAVEROK



Perspektîfa Rêber APO **5**

Rojhilata Navin We Bigihîne Rastiya
Rohniyê

Perspektîfa Jinên Ciwan **9**

Dem Dema Pêşengtî Kirinê Ye!

Portre **12**

Yek Ji Lêhengên Bendava Tîşrînê,
Pêşenga Jinên Ciwan

Jineolojî **17**

Jin Pîne Naxwazin, Jiyanê Dixwazin

Tegeh **20**

Demokrasî

Biranîna Gerîla **23**

Hêza Hevî û Serkeftinê

Nêrîna Jinên Ciwan **25**

Dîrok **27**

Dergûşa Netewa Demokratîk

Destan **29**

Em Di Nava Destanekê De Dijîn

Çalakiya Jinên Ciwan **32**

Rojhilata Navin We Bigihîne Rastiya Rohniyê

“Ya girîng ew e ku kesên doza wekhevî û azadiya civakê dikin divê xwedî helwestên têkez bin û serî li çareseriyên navend-dewlet nedin – ya esas çaresernebûnê û çareseriyên xwe nekin qurban”



Eger mirov Rojhilata Navîn ne weke koma welatan, weke herêma çandê qedîm bigire dest, ev yek dikare encamên manedar bide. Ma ne hêza nûnerî û orjînalîya çanda Rojhilat dike. Ya rastî zemînê wê ye. Çar hezar û pêncsed salan hêza hegomonîk a şaristaniya navendî ye. Xwediyê neolîtîka deh hezar salî ye.

Yekîtiya Ewrûpayê di cîhana ragihandinê de weke hêza herî bibihîse û bizane, gelekî serwexte û haya xwe jê heye ku bê van reforman nikare weke berê modernîteya xwe dewam bike. Jixwe ji tecrûbeya xwe ya pêncsed salî ya modernîteyê gelek tiştan hînbûye. Naxwe, ihtîmaleke xurt e, DYE bi restorasyonê, YE jî

bi reformasyonê bi hev re ji krîza sîstemîk derkevin. Mirov nikare gavavêtineke nû di warê sîstemê de ji YE'yê bipê. Ev zêde li cih û rast nîne. Di mijara sîstema nû de di warê zanista nû û gavavêtina felsefî de wê karibe bi roleke navendî ya hînkê û dest jê nabe, rabe. Lê di nava tevger û hêzên muhtemel ên sîstema nû de wê bi roleke bi sînor bimîne û bi roleke sereke ranebe.

Tê gotin em di dema herî bi hêz a zanist û ragihandinê de ne. Lê tevî vê pêşketina awarte ya zanistê, gelekî seyr e ku zanist hê jî nikare jîyan û çarçoveya wê ya civakî terîf bike. Naxwe divê mirov bipirse: zanista çî û zanist ji bo kê? Çiqasî bersiva van pirsan

Perspektîfa Rêber APO

were dayîn, ewqasî wê baş were fêhmkirin ka çima zanyarên civakî bersiv nadin pirsra bingehîn a weke “Jiyan çi ye û têkiliya wê bi civakê re çawa ye?” Dibe ku ev pirs gelekî besît xuya bikin. Lê hebûna jêre mirov tê gotin bi qasî jiyana xwe manedar e. Piştî ku ev jî nehat fêhmkirin ma çi qîmeta mirov heye! Di vê rewşê de belkî veguhere mexlûqekî ku ji heywanekî, heta ji jiyana nebatekê bêqîmetir be. Mirovatiyeke maneya xwe, heqîqeta xwe nizanibe yan nîne yan jî hebe jî bi awayekî herî rezîl û herî hov heye.

Li Rojhilata Navîn eger mirov bimeşe bifikire, wexta bifikire jî bimeşe wê zêhniyetê manîdar bibe. Ew wextê her tiştê bi awayekî xweza zindî bibe, mîna serdema neolîtîk mirovê bi awayekî pîroz û coş nêzî her tiştî bibin û maneyê bidinê. Wê ramana mîtolojîk a serdemên şaristaniyê

têkoşînê gavê bêne avêtin û hem jî gavên li gorî rastiya dîrok û evîndarên azadiyê. Wê ti kesê nikaribe rawestîne, eger were xapandin, li îxanetê biqewime jî, were kuştin, dîsa jî wê ji deverekê derkeve û ber bi hedefa xwe ve bimeşe. Wê wextê dîrokê bibe ya me, dilê hemû bi me re hilbiavêjin. Wê wextê rastiya civakî wê bibe xwedatiya afirîner a hebûna me. Gelên me wê bibin xwediyê azadiya bi hezarsalan e li hêviyê ne û mafê wan e.

Dîrok her tim bi serê xwe pirsgirêkan pêk nayîne; mekan û demên pirsgirêk têde diqewimin bi xwe re çareseriyên muhtemel jî tînin. Ya girîng ew e, mirov rêyên çareseriyê yên muhtemel û çavkaniyên sereke yên pirsgirêkan û çareseriyên wan bi şert û mercên zeman û mekan ve girêdayî bi awayekî rastî terfî bike û wan ber bi bicihanîne ve bikişîne.

“Gelên me wê bibin xwediyê azadiya bi hezar salan e li hêviyê ne û mafê wan e”

ku bi dersan tijî ye, dîsa pirtûkên hikmetan yek bi yek li pêşiya me vebin.

Em wexta li ser rastiya civakî ya Rojhilata Navîn tevbigerin û bi vê zêhniyeta tarîfa wê hat kirin hundurê wê tijî bikin û bimeşin, ewê me bibe cihên dîrok lê hatiye veşartin, ewê me bigihîne dilê wê yê vemiriyê û bigihîne rastiya wê ya li rohnîyê digere. Wê wextê li nav zeviyên

Ji bo vê jî bi awayekî têrûtijî guftûgokirin û zelalkirin gelekî girîng e. Di rewşeke berevajî de hewldanên ji bo guftûgo û çareseriyê wê bibe şer û pevçûna koran. Di rewşa berbiçav a Rojhilata Navîn de dused salên dawî yên di bin hegemonya modernîteya kapîtalîst de derbas bûn hinekî jî bi awayekî şerê koran pêk hat.


Kurdên hatibûn parçekirin yekîtî û yekparebûn dixwestin; hem jî li ser bingehê Mîsaqêke Millî ya nûvekirî. Dibe ku li dîrokê neheqiyên mezin bêne kirin, lê ti carî jî bîr nake. Roj tê, alî jî bo van neheqiyên ji holê rakin jî nû ve civanê didin hev. Bêguman çareserî pêk nehatiye, lê ketine ser rêya wê. Hêviyên li serê rê peyda bûne her roja diçe bi hêztir dibin.

Welatê Kurdistanê û civaka Kurd jî di serê wan civak û welatan de tên ku herî zêde ji hegemonya modernîteya kapîtalîst bi tesîr bûne, parçebûne, bi pirsgirêk, îmha û serhildanan xeniqîne. Kurd û pêşiyên wan di serdemên destpêkê û navîn de weke civak û welat pêvajoyên bi heman rengî dîtin, lê wexta mêtinkarî û zordestiya di dema modernîteya kapîtalîst de jî li vê zêde bû, cara pêşî pêvajoyekê destpê kir ku hebûna wan bi awayekî ciddî û sistematîk ket tehlûkeyê. Bi ketina vê pêvajoyê re demeke welê bi tehlûke wê destpê bikarana ji aliyê çandî û fizîkî ve qirkirin wê timî biketa dewrê. Di

nava vê çarçoveya giştî de paralel bi beridîna pirsgirêka Kurdistan û Kurd re, çareseriyên muhtemel ên bi xwe re hildigirtin jî timî beridîn û veguherîn.

Bi taybetî berxwedana sîh salên dawî ya PKKê ew jî neçar kirine ku piştgiriya hev bikin û li çareseriyêke federalîst bigerin. Herçiqasî belawela û pirsêrî bin, û dîsa di asta îdeolojîk, polîtîk de qelsiyên wan hebin jî li dora Dewletdariya Netew ya Kurd a Federa wê di şewazê xwe yê çareseriyê de israr bikin. Dewletên netew yên cîran ên xwecihî angoyê Tirkîyê, Îran, Sûrî û heta dewleta netew ya navendî ya Iraqê, çiqasî li ber rabin û qebûl nekin jî ihtîmaleke zêde ye ku bi desteka

**“Dibe ku li dîrokê
neheqiyên mezin
bêne kirin, lê ti carî
ji bîr nake”**



“Di demokrasîyê de jî bo azadî û wekheviyê rêya herî ewle israr e”

hegemonya kapîtalîst a global hebûna xwe mayînde bikin. Hegemonya global vê modela çareseriyê jî bo berjewendiyên xwe li cih dibîne ku li tevahiya Rojhilata Navîn pêk bîne.

Hem çareserîya bi hêza eskerî hem jî çareserîya federalîst a bi hevkarî, kapasîteyên herduyan yê civakî teng in. Çareserîyeke li gorî berjewendiyên tevahiya Kurdan û civakên cîran nîne. Ev modelên çareseriyê di navbera tebeqeya jor û modernîteya kapîtalîst de modelên çareseriyê yê li ser li hev kirine, nîşan didin. Çiqasî jî beşê jêr ê civakê bitirsîn, ewqasî xwe nêzî pêdiviya bi çareseriyê dikin. Çareserîya li cem tevahiya tevgerên rizgariya neteweyî û sendîkavaniya çîna navîn, çareserîyeke çîna navîn e. Çaresernebûna pirsgirêkên heyî bi vê çîna navîn re têkildar in. Her çînek kapasîteyê xwe ya çareseriyê heye. Ji bo ku pirsgirêkên civakî jî binî ve û bi kok bêne çareser kirin, divê hêmanên civakî yê demokratîk ên li derveyî hêmanên modernîteya kapîtalîst bikevin dewrê û bi rola xwe ya dîrokî rabin. Ji bo modernîteya kapîtalîst a Kurd pêk bê dîrok

derfet û îmkanên pêdivî bi wan hene nadiyê. Lêgerînên çareseriyê yê ber bi dewleta netew ve di wê hêzê de nînin ku jî federalîzmê bibihurin. Federalîzm bi serê xwe nikare di çareser kirina pirsgirêkên civakî yê Kurd de ku ketine qonaxa krîza akût, têrê bike; bi tenê dikare di çareserîya neteweya demokratîk de bi rola xwe rabe û bi vî awayî dikare fikarên jî kêmmayîna wê çêbûne jî holê rake.

Kengî PKK'ê dev ji dewletbûnê berda û ket ser rêya rast wê demê bû siyaseta demokratîk, ev bû veguherîna bingeîn. Ne ku zehmet bû, dev ji avakirina dewleteke netewe ya sosyalîzma pêkhatî dihat berdan. Ji ber ku şewazekî jiyane hebû ti cudahiya xwe jî şewazê jiyana kapîtalîst a li tevahiya cîhanê tinebû.

Mafên jinê û azadiya wê jî di pêvajoya pêşketin û demokratîkbûnê de roleke girîng dilîze ku dest jê nabe. Emê vê mijarê hînê binirxînin. Ya girîng ew e ku kesên doza wekhevî û azadiya civakê dikin divê xwedî helwestên têkez bin û serî li çareseriyên navend-dewlet nedin - ya esas çaresernebûnê û çareseriyên xwe nekin qurban.

Di demokrasîyê de jî bo azadî û wekheviyê rêya herî ewle israr e. Mîna Lenîn got, dereng be jî tenê bi vê helwestê yanî bi bêhneke fireh û xurt demokratîkbûyîn bibe.



DEM DEMA PÊŞENGÎ KIRINÊ YE!

Hevalên hêja hun jî dizanin ji 27'ê Mijdara 2024'an heya niha em di nava şer û qeyranên mezin de derbas dibin. Bi berdewama van êrîşan em di nava êrîşên dijwar û li hemberî wê di nava berxwedaniyêke bê hempa de ketine sala nû. Bê guman bi sedan sale gelê kurd her tim di nava şer û berxwedanekê de ye. Lê pêwîste baş were zanîn ku êrîşên di van 10 salên dawî de tîr kirin di merheleyêke ku bi giştî tîr kirina hemû nîrxên civaka kurd û dagirkirina Kurdistanê hatiye armanç kirin de ye. Di vê merheleyê de ya ku pêwîste em baş bi zanin û li gorî wê xwe bi cih bikin ewe ku "ji derveyî berxwedan, tekoşîn û şer kirinê wêdetir tu bijarteyên me nînin". Pêwîste vê yekê em baş bi zanin û li gorî wê li erk û berpirsyartiyên xwe xwedî derkevin.

JINÊN CÎWAN!

Me saleke tîr û tije ya bi berxwedanê derbas kir. Di vê salê de bi taybet di şexsê gerîlayên YJA-STAR û ber bi dawiya salê de di şexsê Ş. Asya ALÎ û Ş. Rojger HELÎN' de derbeyên dîrokî ku sendrom ava kirî li dijmin dan. Rojên ku dewleta tirk daxuyanî da û got "me kilît li Zapê da" Ş. Asya û Ş. Rojger di navenda paytexta dijmin de çalakiyêke bi her awayî profesyonel û canbexşane

Perspektîfa Jinên Ciwan

pêk anîn. Ev çalakî bu bersîva hemû hêzên dagirker û qirker. Di heman demê de ji bo me jî bû peyama rêhevaltiya rast û pêwîstiya rexnedayîna rêhevaltiya kêr derxist holê. Raste herî girîng ya di vê pêvajoyê de derketî holê jî ew bû ku di encama berxwedaniya jin û ciwanan de dijmin neçar ma, çû Imraliyê û rêya çareseriyê dîsa di fikir û ramanên Rêber Apo de dît.

Ji ber vê jî niha pêwîste ku wekî jinên ciwan em bi her awayî xwe di serkeftinê de kilît bikin û rol û mîsyona xwe ya pêşengtiyê bi cih binin. Niha dem demê pêşengtî kirinê ye. Ger ku em pêşengtiyê rast dernexînin holê xeteriyên pir mezin li pêşiya me ne.

JINÊN CIWAN!

Hun jî di zanin bi salane li Rojhilata Navîn şerekî dijwar yê dagirkeriyê tê meşandin. Ev şer bi hêzên netew dewletî yên ku bingeha xwe ji zihniyeta zilamsalarê digrin ve tê meşandin. Armanca van hêzan ya sereke ewê ku Rojhilata Navîn bixin bin tarîtiya qirkirin, îşkence, tecawîz û tundiyê. Ne tesadufe ku hemû hêzên dagirker dema gundekê, bajarekê an jî welatekê dagir dikin yekser êrîşî jin û zarokan dikin. Tecawuzê jinên ciwan dikin û wan qetil dikin. Me mînakên vê yê herî şênber di êrîşên çeteyên DAIŞ'ê ku ji aliyê dewleta tirk ve hatine finanse kirin yên li Kobanê, Efrînê, Serêkanî û Girê Spî dîtin. Di dagirkirina van bajaran de kiryarên van çeteyan yên yekemîn ew bûn ku bi sedan jinên ciwan hatin tecawuz

kirin, hatin qetil kirin, li bazaran de hatin firotin. Herî dawî jî heman çeteyên ku tenê navê xwe guherî û kiriye HTŞ bêyi ku şer bikin ji Helebê destpêkirin û heya Şamê bi dizî, talan, îşkence û qetlîaman ve çûyi, berî her tiştî êrîşî jinên ciwan kirin. Rejîma BAAS ya ku bi salane li hemberî gelê me zilm û zordariyê mezin raber dike di 12 rojan de teslîm bû û welatê xwe terikand. Bêguman ne ev çete bi şerekî dijwar û berdelekê heya Şamê çûn, ne jî ev rejîm bi rastî jî di 12 rojan de ruxiya. Ya rastî ewê ku roja di pêşengtiya jinên ciwan de Şoreşa Rojava rû da û ji bo hemû jin, ciwan û gelên bindest yên cihanê bû hêvî û bawerî wê demê rejîma BAAS hilweşiya. Ne tenê rejîma BAAS hilweşiya, çeteyên DAIŞ'ê jî, dewleta tirk jî şikandineke mezin jîyan kirin. Bi

“Xwe di serkeftinê de kilît bikin, rol û mîsyona xwe ya pêşengtiyê bi cih binin”

berxwedana YPJ dîrok hat nivîsandin û wekî Arîn Mîrkan, Avesta Xabur û Barîn Kobanê bi sedan jinên ciwan bi canbexşane ketin nava pelên dîrokê de. Îro jî çeteyên dewleta tirk ên berhemên DAIŞ'ê ne bi awayekî hovane

êrîştî Şoreşa Rojava dikin. Pêwîste îro jî wekî jinên ciwan bi heman hêz û baweriyê pêşengtî bikin û şoreşa jinê biparêzin. Ji ber ku îro pêvajoyên dîrokî li pêşiya me disekînin. 15 sal di şexsê Şoreşa Rojava de bi fikir û ramanên Rêber Apo li hemberî netew dewletiyê, pergala netewa demokratîk tê ava kirin. Di nava vê pergala jiyana nû de bawerî, netew û hemû pêkhateyên civakê bi rengê xwe, bi çanda xwe, bi ziman û bawerîya xwe bi hev re jiyana dikin. Di vê pergalê de ji desthilatdarî û tundiyê re derfet tûne ye. Ji dagîrkerî, talan û dizî re mecal tûne ye. Ji ber ku di ava kirina vê pergalê de berdel û tekoşîneke mezin ya jinê heye. Li cihê ku pêşengtiya jin û ciwana heye,



Rojhilata Navîn yên di bin dagirkeriya netew dewletiyê de ne çaraseriya yekane ye.

*“Bê dewlet jî
jiyan dibe, lê bê
rêxistinbûyin û
tekoşînê tû derfetê
jiyanê nine”*

li wê derê meşaleya azadiyê pêketiye û tû hêz nikarin bitefnin. Pêwîste em vê yekê baş bi zanîn ku “bê dewlet jî jiyana dibe, lê bê rêxistinbûyin û tekoşînê tû derfetê jiyanê nine”. Ji ber vê jî ev rojên ku bi berdelên mezin, bi tekoşîneke mezin hatine hunandin ne tenê ji bo me, ji bo hemû gelên

JINÊN CIWAN!

Hevalên hêja, pergala netew dewlet ya bingeha xwe ji zihniyeta zilamsalariyê digre bi hewldaneke mezin êrîştî pergala me, nasnameya me û rumeta me dike. Dixwaze me di nava vê pergalê de bihelîne, tûne bike. Tûnebûna me wê bibe dawîya civakê, dawîya çand û exlaqê, wê bibe dawîya jiyana. Ger em bizanibin em kî ne, wê demê emê li nasnameya xwe jî xwedî derkevin.

Di nava civakê de nasnameya herî dewlemend ya jin û ciwana ye. Ji ber vê nasnameyê jî her tim li hemberî êrîşên qirkirinê re rû bi rû dimîne. Lê bi pêşengtiya vê nasnameyê me bersîva pirsê “çawa bijî” bi paradîgmaya Rêber Apo jiyaneke nû li vê xakê ava kir. Tenê li xaka Rojavayê Kurdistanê na, li çar




*“Îro ji her demê zêdetir
pêwîstiya bilind kirina
tekoşîn û berxwedanê
heye”*

aliyê Rojhilata Navîn me hêz û bawerîya xwe belav kir. Me bi felsefeya “Jin Jiyan Azadî” li hemberî zagonên darvekirinê serî netewand. Li hemberî yekdestiya hêzên wekî talîban yê n olperest me berxwe da û em teslîm nebûn. Di nava tarîtiya faşîzm û netewperestiyê de me ji dîroka jinên kurd sud vergirt û ji Dersîmê heya Belucîstanê em bûn Zîlan û me yekdestî tarumar kir. Em Kurd, Ereb, Ermen, Fars, Tirk, Suryan, Elewî û hemû gel û baweriyên li Rojhilata Navîn’de jiyan dikin me bi pergala Netewa Demokratîk îspat kir ku em bi hevra hîn xweşiktir û dewlemendtirin. Ev hemû kiryarên vîn û bawerîya me ne ku li her derê şîn dibin.

Hevalên hêja, em êdî ne wekî berê ne. Em xwe nas dikin û ji hêza xwe bawerîn. Lê ji bo ku em azadiya xwe mîsoger bikin tenê xwe nas kirin

têre nake. Îro ji her demê zêdetir pêwîstiya bilind kirina tekoşîn û berxwedanê heye. Me got em di pêvajoyeke dîrokî de derbas dibin, lê ger ku em di vê pêvajoyê de derfetên ku li pêşîya me ne baş ne nixînîn emê binketineke herî mezin jî jiyan bikin. Lê ev rastî jî heye, ger ku em pêşengtiyê rast bikin û em bi rêxistinbûyîna xwe mezin bikin, tekoşîna xwe bilind bikin û xwe di serkeftinê de kilît bikin emê teqez biserkevin. Ji ber vê yekê jî em erk û berpirsyartiyên xwe ne avêjin ser milê hevdu, em bi berpiryartî, bi coş û bawerîyê mezin seferber bin û di nava berxwedaniya heyî de cihê xwe bigrin. Ji bîr nekin ;
Îro dem dema azadiyê ye, DEM DEMA PÊŞENGÎ KIRINÊ YE!



Nasnav: Ronahî Yekta
Nav û Paşnav: Arşîn Hisên
Cîh û Dîroka Dayîkbûnê:
Sala 1995- Efrîn
Dîroka Tevlîbûne:
28.02.2014
Cih û Dîroka Şehadetê:
25.12.2024/Bendava Tişrîn

Yek Ji Lêhengên Bendava Tişrînê, Pêşenga Jinên Ciwana



Ji tavê heta ronahiya kû dide li ser erdê, navê wê Arşîn weke qurşîne, nûra wê dide çavan û dibe stêrkên li ezman, ey xwedawanda roj û heyvê, ey keziyên henekerî pêlên porên wê mîna pêlên neherê, mîna dicê û firat dirêj. Li wê derê serê xwe li ser keverên çemên wê danî û kete xewnekî bê dawî. Kete nava xeyalan ronahiya ciwan û delal.

Femandara YPJ'ê Heval Ronahî Yekta yek ji fermandarên leheng yên berxwedaniya bê emsal ya eniya bendava Tişrîn û Qereqozaxê bû. Li ser kesayêtên şehîd wiha qeheraman, destanan nivîsandin gelekî zehmet e, taybet kesên ku me pêra jiyana kir û di carekê de bi pênusa xwe anîna ser ziman hin zehmetir e, lê ji bo ku ez karibim bi we bidim nasîn kêma bê jî ezê ji wera behs bikim.

Heval Ronahî di malbetekî welatparêz de mezin dibe, roj bi roj bi derbasbûna rojê re mezin dibe û weke heyvê xwe nû dibe û di ciwantiya xwe de dest bi kar û xebatên ciwanan dibe. Di sala 2012 de dema heval Rustem Cûdî şehîd dibe heval Ronahî dixwaze tevî merasîman bibe, lê dayîka wê jêra dibe asteng û nahêl. Lê heval Ronahî def ji israra xwe bernade û bê ku dayîka wê bizanibe bi komekî hevalên xwe re derbasî milê Cizîrê dibe û tevî merasîman dibe. Bi dîtina oxirkirina hevalên xwe di dilê heval Ronahî de hers û tolhildan mezin dibin û hestên şoreşgerî êdî şîn dibin. Her çiqasî heval Ronahî carekî din derbasî Efrîn dibe, bandoriya şehadeta heval Rustem li ser wê naçe. Ji ber vê jî piştî wê heval Ronahî soza xwe dide. Heval Ronahî ji deqeya ku tevî dibe bi fikrê Rêber Apo tê girêdan û dixwaze ev girêdanbûn di her kesî de bide ava kirin.

Heval Ronahî bi keseyeta xwe ya zelal gelekî bi heybet bû û mîna taybetmendiyên ciwantiyê radîkal, bê tirs û xuf bû.

“Di jiyana heval Ronahî de paşdeçûyîn nîn bû”

Her wiha di sala 2015 de, dema heval Ronahî derbasî Kobanê dibe rastî berxwedaniya mezin tê. Di dema komkujî de ji bo ku nekeve destê dijmin çend rojan di bin malekî xirab da dimînê û dijmin pê nahese, piştî vê demekî li Kobanê kar û xebat ciwanan dide meşandin. Ji bo ku zû fêrî sosyolojiya gel bibe, her dem di destê wê defter û qalem heye û her kesî guhdar dike. Heval Ronahî ket her malekî û ziyaret kir, malên ku derbas nebûbû jî, ji heval Ronahî bihîstîbûn.

Tê bîra min di sala di 2020 de dema ez carekî çûm Kobanê derbasî çend malbatan bûm, di vê demê de jî behsa heval Ronahî dikirin. Ez gelekî bandor bûm ji ber sekna û tarzê wê wekî gerîllayekî jin û hevarekî ciwan gelekî li ser jinên ciwan û ciwanên Kobanê bandor kirbû. Ev tiştên ku li ser defterên xwe dinivisand tenê di vir de nedihîşt, bi hevalên derdorê xwe re parve dike.

Di sala 2016 de jî derbasî Efrînê dibe vê demê di êrîşên dewleta tirk a dagirker de di lingê xwe de birîndar dibe. Di jiyana heval Ronahî de paşdeçûyîn nîn bû. Ruxmî ku birîndar bû lê kar û xebatên xwe dewam kir. Ev sekna wê ya mîna jinekê xwedî îradeyekê ewqas xurt hertim minak bû. Dema carayekê heval Ronahî dît birîndar bû. Dema min sekna wê wisa dît min ji xwe re got ku ez ji rojekê dixwazim bibim wekê wê. Hestên wê wekê jinekî gelekî xurt bûn, mirovan zû fêrî dikir û dizanîbû yê li hemberî wê çî hîs dike çî êşê xwe heye. Ev jî dihîşt ku her kes derdorê heval Ronahî kom bibe û wekê heza çareserî diditin. Demekî li Çiya dimîne şunda carekî din derbasî Rojava dibe. Ji bo bibe bersiv ji her jinekî û ciwanekî li Herêmên Rizgarkirî kar û xebat dide meşandin. Di vê qadê de taybet ji bo jinên ciwan ya ereb kedekî mezin dide



Portre

da ku her jinekî li ser xeta Rêber APO de bide meşandin. Heval Ronahî bû rêheval û hogira jinên ciwan û ciwanan. Bi evîna şoreşê ciwanan perwerde dikir. Di aynî demê de jî di hemû herêmen Bakur-Rojhilatê Sûriyê de xebatên rêxistinkirinê meşand.

Di sala 2021'an de derbasî qada eskerî dibe û nava refên YPJ de dibe yek ji fermandarin



lêheng. Perwerdeya hêzên hewayî dibînê û xwe di vê milê de pispor dike. Tecrûbe ku di xebatên ciwana de girt jêre bû bingehê xurt a têkoşînê. Heta kêliya ku çavên xwe li jiyandê girt bi ruhê xwe ya ciwantî bi moral û coş têdikoşiya.

Heval Ronahî dilê efrînê bû, hemû taybetmendiyên efrînê di xwede dihewand. Heta roja şehadeta xwe jî di şexsê xwe de

ruhê milîtaniya Apoyî zindî bû. Dewleta tirk a dagirker bi êrîşên xwe ya hovane dixwaze gelê kurd bin ax bike. Lê hevalên me ya qeheraman mîna fermandara YPJ Ronahî Yekta li hemberî wan hewldanan berxwedandekê bê hempa raber dikin.

*“Bû rêheval û hogira
jinên ciwan û ciwanan,
bi evîna şoreşê ciwanan
perwerde dikir”*

Bendava Tişrînê ji bo me bûye xeta sor û di vir de destana 2025 despê dike. Ronahî Yekta di vê destanê de rolekê serekê leyst û bû yek ji wan lêhengan ku dîrok nivisand.

Xwe gelekî bi şans dibînim ji ber min hevalên mîna heval ronahî naskirin û bi wan re jiyandî kir. Wê hestên me ya tolhildanê mafê jiyaneke nû bidest bixin. Em, rêvahala xwe fermandar Ronahî Yekta bi hurmet û rêzdariyeke bêdawî bi birtinin, li pêşberî bîranina wê bejna xwe ditewînin. Emê di têkoşina xwe ya mafdar û birûmet de bîranina wê tim bidin jiyandin û em soz didin ku tola şehîdên xwe, bi misogerkirina jiyana azad û wekhev tacîdar bikin. Têkoşina şehîdan ji her demê bêtir rêya me, doza me û armanca me ya serkeftinê ronî dike.





JIN PÎNE NAXWAZIN JIYANÊ DIXWAZIN

Konfederalizma jin çî ye û çîma pewistiya me pê heye ?

Dema ku mirov pergalên heyî yên dewletan meyze dike; her dewlet bi hişmendiya desthilatdariya zilam re maf û hebûna jinan bin pê dikin. Hişmendiya netew-dewlet ew e ku jin tune dike û biryardayinê derbare jiyana jinan nahêle. Jin bû yê herkesî lê tenê nebû ya xwe.

Ji ber vê di 100 salên dawî de jin di her aliyên cihanê rêxistinên xwe avakirin û ji bo hebûna xwe têkoşyan. Wek jinên Amazon, rêxistina Begin an jî artêşa jinên Êzîdî ya Sîtiya Nisra bûn bingeha vê tekoşinê.

“Jin bû yê herkesî lê
tenê nebû ya xwe”

Lê di gelek şoreşan da wek Rusya, Çîn û Fransa jî xuya bû ku jin çiqas rolekî girîng jî bilêzin, piştî “şoreşê” ketin hale xwe yê berê. Li ber malê bûn, zarokan meyze dikirin û di bin siya zilaman de man. Bi kurtasî destkeftiyên mayinde ji bo jin derneketin. Di heman demê de gelek rêxistinên ku hebûn bi hişmendiya baviksalarî parçebûn û bê hêz hatin hiştin. Ji bo vê çareseriyekî pêwîst bû. Ev jî tenê bi rêxistinkirina Konfederalizma Demokratîk Ya Jin re wê bibe. Her rêxistinekî ya jinan ji her qada jiyane bi rege xwe û tevgerandinekî hevpar tevli dibe.

“Her rêxistinekî ya jinan ji her qada jiyane bi rege xwe û tevgerandinekî hevpar tevli dibe”

Yekem car Rêber Apo di sala 2005'an de Konfederalizma Demokratîk a Jinan pêşniyar kir. Di heman demê de Rêber APO di nirxandinên xwe de pêdiviya rêxistinîbûn û di her qada jiyane de çawa rengê xwe diyar bikin jî destnîşan kir.

Konfederalizma Demokratîk Çawa Were Avakirin?

Konfederalizma demokratîk modelekî civakî û siyasî ye. Şêwaza herî guncav ya ku di bingeha xwe de kesê azad û civaka demokratîk di hawîne ye. Jixwe nasnameya bingeheîna civakê yekîtiya ye. Yekîtiya ku hemû reng û cûdahiyên digre nav xwe. Modela her kes ku bi nasname û cewhera xwe tevli jiyane dibe, jiyane rêxistin dike di hemahengiyek de jiyane dike. Şêwaza Konfederalizma demokratîk rista sîwan de ye. Gelek şaxên xwe hene û hemû beşên civakê jî ji vana berpirsiyarin. Bi taybet jinên ciwan di avakirina pergala Konfederalizma Jinan de di rista pêşeng û parzvan de ne. Pergalek bê parastin û bê pêşeng nabe. Divê hêza xwe ya zindî, jîndar û dînamîk hebe, ev jî di karakterê jinên ciwan de heye. Yek jî erkê jinên ciwan jî di nava vê pergale de rêxistinîbûna xwe ava bike ye. Di sîstema xwe da divê sîstema aborî, ramanî, çandî, parastin, bîrdozî û rêxistinî avabike.

Bi Konferansên ku li Rojhilata navîn û gelek cihên cihanê jin pirsgerokên xwe parvekirin û nirxên şoreşê wê çawa werin parastin niqaş kirin. Di navbera salên 2010-2011'an ku salvegera 100'emîn ya 8'ê adarê (Roja Jinên Kedkaran ya cihanê) bû, gelek bangawazî çêbûn. Jin bang kirin ku li herderê konferansên jinan bîn çêkîrin. Bi vê jî pêngavekî nû destpêkir. Ev pêngav ji bo



“Qadên azad ku jinan bi ked û destê xwe avakirine hene”

rêxistinkirin û pêşxistina siyaseta jin ku li dijî pergala mêtînger, kapîtalîst û bavîksalar bibe alternatîfeke xurt. Bi vê jî jin dibin bersiv û dikarin parçebûna ku nav jinan da heye derbas bikin. Bikaribin li hemberî Daiş, Talîban, hêzên olperest, nijadperest û zayendperestên ku bi qirkirina jinan ve xwe dimeşînin re bibin hêza çareseriyê.

Ji ber ku aqle jin li her derê yek e û tiştên ku jin jiyana jî dikin yek e. Jin li heft parzaminên cihanê heman pirsgirêkan jiyana dikin (tacîz, destdirêjî, kuştin, tund û tijî, firotin, wek namus didit û hwd.) pewîste jin hevdu zêdetir hîs bikin, guhdar bikin û hez bikin. Bi vê rengê dikarin bibin bersiv dijî pergala desthilatdarî ku jinan qatîl dike, civak parçe dike û xweza talan dike. Ji ber vê yekê bi pîne û reforman re çareserî ava nabe. Divê bi helwestek radikal û demokratîk jin jiyaneke nû ji bo xwe avabikin.

Di serî de jî divê bawerîya wan bi jiyana nû hebe. Ger na wê nikarin xwe ji êrîşên pergale rizgar bikin û wê bibin beşek ji vî sîstemê. Ji jiyaneke lîberal ku xizmeta desthilatdarî û dagirkeriyê dike re ne rizgarî û ne jî azadî gengaz e.

Jinên ku bi têkoşîn û jiyana xwe bûne nasname û ruhê yekîtiya jinan hene. Qadên azad ku jinan bi ked û destê xwe avakirine hene. Ji çiyayên Kurdistanê hata Rojava, ji Bakur hata Rojhilat û Başur ku qada şoreşa jinê ye dengvedanek ji bo tevahî jinên cihanê çêkir. Ev dengvedan bi Şehîd Sara (Sakine Cansiz), Asya Alî, Sara û Bişeng, Ronahî Yekta xwe bi nasname kir. Li ser vê bingeheke paradîgmaya civaka demokratîk, ekolojîk û azadiya jinan ji nû ve gerdûnî dibe.



DEMOKRASÎ

Demokrasî Çiye? Çima demokrasî?

Di be ku dema em dixwazin pênaseya demokrasî bikin bi awayekî rihet dikarin bêjin ku xwe bi xwe rêvebirine lê em vê pirsê ji xwe bikin kêjan ji me xwe bi xwe rêve dibe?

Ji bo wê yekê Rêber APO dû pênaseyên demokrasîyê dike dibêje di wate ya teng de demokrasî xwe bi xwe rêvebirina civakê ye di wateya fireh de dema pênase dike dibêje xwe rêvebirin û şewazê jiyana civakên ku dervayê dewletê mane ye.

Wê demê pêwîste em xwe bighînin pênaseya Rêbertî ya fireh ya demokrasî yê. Ji ber ku em bi tenê nikarin bêjin ku ka bê ku ziman, çand, hişmendî, perwerde, parastin, tenduristi, sîstema xwe rêvebirinê ya me be, ya girîng di

aynî demê de wek civak emê çawa xwe rêve bibim. Dema ku giştî qadên jiyana yê civakê di destê wî bi xwe de nebe nikare xwe bi xwe rêve bibe ji bo wê yekê destpêkê pêwîste civakê destpêkê giştî nixê ku jê hatine dizîn careke din bi dest bixe li ser kok û nixê xwe be ku bikaribe jiyana xwe tanzîm bike. Ji ber ku Demokrasî ne tenê xwe rêvebirinê ye, ji bo xwe rêvebirinê destpêkê azadî pêwîste.

Di demokrasîyê de bingeha esasî berpirsyartî ye, xwe berpirsyar ditine, nêrin girtine. Lê pir caran wek ezezîtî tê destgirtin çî bixwazim wê bikaribim bikim ev lîberalîzmê ye, divê ji xwe pirs bikin çiqas xwe ji civaka xwe berpirsyar dibînim. Çiqas berpirsyartî radikim lê ya ku derdikeve pêş bila hinek berpirsyartî rakin hinek li dewsa min bêjin, biryar bigrin,

lêpîrsîn bikin ez jî bikim. Divê warê exlaq û vîcdan de kes xwe lêpîrsîn bike û rewşa berpirsartî ranekirinê çiqas exlaqî ye. Ji bo vê yekê Rêber APO got civakeke demokratîk yanî civakeke exlaqî u polîtîk, exlaq xirab bibe yê çawa polîtîk bibe nikare pêk bîne yanî nikare demokratîk bibe. Ev ji bo kes jî civak jî derbasdare. Ji bo ku bikaribî derbarê xwe de biryaran bigrî pêwîste xwedî hişmendîyek dîrokî bibî, çî başe çî şaşê bizanibî, bi zanist bî. Ger ev yek nebe kê çî biryarê bigre tu yê

“Her cudahîyek bi îradeya xwe bikaribe li ser kok u nirxên xwe jîyan bike”

tevlê wê bibî. Ji bo ku bikaribî biryarê xwe bi xwe bidî pêwîste xwe bizanibî. Civaka demokratîk kesayetê demokratîk pêwîstîya xwe bi hişmendîyek exlaqî u polîtîk heye yanî pêwîstîya xwe bi azadîyê heye ji bo vê jî tekoşîn pêwîst dike.

Giştî demokasî girêdayê cudahîyanin ji ber ku hişmendîya cudahîyan hişmendîya demokrasîyê, ji bo wê pêwîste em destpêkê pênaseya cudahîyan bikin. Jin bûn cudabûneke ,mezhebek cudahîyeke,

zarok cudabûneke, wê demê emê van giştî cudahîyan çawa bînin gel hev. Ger demokrasî an demokratîkbûn nînbe nikare civakekî rêve bibî. Ji ber ku tu nikaî cudahîyan pişt çav bikî cudahî dewlemendîye ji ber ku ev buyarek xwezayî ye. Lê belê yekbûna van yekan rêbazek xurt dixwaze ku ji bo şibandina hev dernekeve holê, ji ber ku dema şibandin çêbe ev nabe demokrasî ev dibe yek reng, pir rengbûn di vir de tê kuştin. Li ser wî esasî her cudahîyek bi îradeya xwe bikaribe li ser kok u nirxên xwe jîyan bike.

Di pergala jîyana nû ya ku Rêber APO daye avakirin ya civaka demokratîk, ekolojîk, azadîya jin de civakeke demokratîk yanî civakeke exlaqî û polîtîk avakirin hişmendî avakirin ve dibe ku pêwîste zîhnîyet were bi hêz kirin ji ber ku em niha wek sîstem bi sîstema kapîtalîst re bi hev re jîyan dikin ger fêmkirin û pêkanîna demokrasîyê nîn be di vê derê de yê helandinê çêbibe, rê û rêbaz divê ne rêbazê îdarekirin yê, cudahîya nas dike bi heşmendî pêşengî dike be. Di vê derê de dema em civakê digrin dest ya ku bingehê civakê ye bê guman hêza jin û ciwana ye ji ber ku ya ava dike jin e jin ji ber ji xwe dide ji civaka xwe berpirsare ji ber xwezayî xwedî hêstê berpirsartîyê ye şewazê wê yê jîyanê ewê yanî demokrasî bi xwe şewazê jîyanê ye ku bê ku tepisandinek hebe tu bikaribî xwe



Îro ev yek Bi Şoreşa Rojava beden girtîye. Kurd, Erebo, Suryan, Alevî, Mesihî û Mislîman bi hev re bi ziman û çanda xwe bi hev re xwe tanzîm dike xwe bi xwe rêve dibe û ji bo giştî cihanê dibe model di vê derê de bi avakirina sîstema xwe ya perwerde, aborî, komîn, meclîs hwd. bi pêşengtiya jin û ciwanan rihê civaka

“Bi pêşengtiya jin û ciwanan rihê civaka exlaqî û polîtîk zindî dibe”

pênase bikî. Dîsa ya diherike û hêza dînamîk a civakê hêza ciwana ye. Di vî milî de yê ku herî zêde pêwîste bi heşmendî bike jî ciwan bi xwe ye. Dema ku ev hêz rolê xwe nasnameya xwe jîyan neke tu civak nikare cîhê ku runiştî ye de bêje ez demokrasîyê pêk bînim. Divê yê ku pêşîya cudahiyan dibe asteng ji holê were rakirin ev yek jî tekoşînê dixwaze yanî hêza vê tekoşînê dibe hêza jin û ciwan. Ji bo wê sîstema dewletê jin dike meta û ciwanan jî destpêkê di dibistanê xwe yê asîmîlasyonê de derbas dike.

Ji bo vala derxistina van polîtîkayan û vegera cewherê xwe avakirina civaka exlaqî û polîtîk esasî ye. Ji bo wê jî kesayetê demokratîk pêwîst dike. Yanî xwedî hişmendiyek dîrokî bûn, jîyanek sosyalîst jîyan kirin û rihek hevpar avakirin, dema ev yekan hate avakirin wê derê mirov dikare bêhna azdîyê bigre.

exlaqî û polîtîk zindî dibe û giştî civakan ronî dike li ser wî esasî jî di roja me ya îro de ji aliyê sîstema sermayedar bûye hedef û êrîş û qetliyaman re rû bi rû dimîne ji ber ku dema demokrasî hebe di wir de îktîdar tûne dibe. Ji bo sîstema bavîksalar ya desthilatdarîyê xwe ser linga bigire êrîşê pergala şoreşa me ya netewa demokratîk dike.

Ji ber ku demokrasî şewazê jîyana civaka ye û di cewherê wê de exlaq heye, civak ku hertim berê xwe dide cewhera xwe. Ji bo vê jî rêya serkeftinê, di destpêkê de xwelîkkar û avakerê vê jîyanê Rêber APO ye. Fizikî azadkirina Rêber APO û firehkirina, mezinkirina sîstema netewa demokratîk ve bi hêza jin û ciwanan mîsoger bibe. Emê bi Rêber APO re di nav jîyana azad de bi hev re jîyan bikin.

Hêza Hêvî û Serkeftinê



*“Dema ku me tiştên xwe
di seyarê de derdixist, li
ser me fişek avêtin”*

Ez û hevalên xwe 2012 gundekî li Colemêrgê bûn. Me xebatên parastina cewherî dimeşand. Me planloma çêkir ku em biçin ew gundên ku heval neçûnê. Me xwest em wan gundan nas bikin û karê xwe li wir rêvebibin. Ew gûndê ku emê biçinê cerdewan têda hebûn û li derdorê wê jî qereqol hebû. Me dixwest li wê gundî kar bikin. Ji ber ku di wê gundîde welatparêz jî hebûn. Ji bo çûyîna gund me amadekarî û rêxistinkirina xwe jî kiribû. Wê demê heval pir çalakî lidarxistibûn. Em jî li gorî wê nêz dibûn. Ji bo ku em şiyar tevbigerin hevalan hin hişyarî li me kirin. Me jî rewş dizanî û em li gorî wê nêz dibûn. Hevalên din berê çûbûn wê gundî lê ez neçûbûm. Ji bo wê jî heval gundî û derdora gund nas dikirin lê min nas nedikir. Lê ez ji hevalan bawer bûm. Mala ku em biçinê me di berêde agahî dabû wan. Me ji milîsan re gotubû ku, emê rojek werin lê me ne gotibu ku emê kengê werin. Me wisa tedbirê xwe digirt û me ji wan re digot, bila amadekariyên we hebe. Kengî em werin ne diyare û dema em hatin hûn bikaribin me di gûnd de biparêzin. Wê baş be.’

Em hatin binya gûnd. Gûnd di yamacê dê bû. Dema em gehiştin nêzî gund em ji seyarê daketin.

Bîranina Gerîla

Me ji şoforê seyarê re got, dema ku tu gihiştî virajê bisekine, emê eşyayên xwe di nava seyarê de derbixin. Dema ku me tiştên xwe di seyarê de derdixist, li ser me fişek avêtin. Me nizanîbû çima wisa bû. Qereqol û cerdewan bi me nehesiyabûn. Me mêzekir fişek berdawam dike. Me mîlîs re got, 'tu biçe xwe xelaske. Emê ji di nava arazî de xwe biparêzin.' Mîlîs çû, me jî bi şiklekî xwe gihand nava gund û em çûn mala milîsê xwe. Me di pencere da hevjina mîlîs dît. Di pencerê de li me mêzekir û em nasnekirin, tirsîya. Me je re got; 'ne tirse bang li hevjinê xwe bike.' Mîlîsê me hat dema ku me dît matmayî ma ji ber ku ne li benda me bû ku emê di wê demêde werin gund.

Ew vîraja ku em lê sekinîbûn, wî kesî varêlê xwe ê mazotê danaye. Beriya wê jî hinek kesan seyarayên xwe li wir sekinandine û gaz û mazota gundiyan dizîne. Agahiya me ji vê bûyera ku berê çêbûyî nîn bû. Me jî cihê bûyerê çend deqîqeyan seyara xwe sekinandibû. Wan jî gotin, qey em jî dizin û ji bo ku mazot û benzîna wan bidizin li wir sekinîne. Wî kesê ku dîn em dîtine. Digotin dîne, lê nedîne. Wekî nobetçiyê gund tevdiqerîya û gund diparast. Çawa ku me dibîne li ser me fişek davêje.

Me meselê fehm kir û em rehet bûn. Me got, ne dijmîne ew tiştêkî normal e. Piştê wî kesê ku jêre digotin, dîne, pesna xwe daye û gotiye; 'diz hatine mazot û gaza me bibin lê min li ser

"Gundî jî pir kewxweş bibûn. Me kar û xebatê xwe li wî gund serkeftî derbaskir"

Me rewşa di serê me de derbasbûyî jêre vegot. Me pirs kir, çima di nava gund de li ser me fişek hat teqandin? Wî jî ji me re got ku, pir caran wisa kirine û got ku ewê biçe sedema rewşê pirs bike û bizane. Me milîs re got, 'dema ku te agahiyên zelal ji mere anî emê wê demê bikevin mala tede.' Milîs çû û pirs kir. Piştê dizane ku kesekê ku di nava gundiyan de wek dîn tê naskirin heye û li cem wî jî çek heye. Dema ku seyarê dibîne jî fişek diteqîne. Ji ber ku gund nêzî sînore di gund de bazîrganiya mazot û gazê tê kirin.

wan fişek avêt, seyarê tirsayaye û çûye. Lê em bûn, nedizbûn û me dizîya mazot û gazê nedikir. Em hatibûn ku kar û xebatê xwe bimeşînin. Piştî wê agahiyê em rihet bûn û me plansaziya xwe çêkir. Me dest rêxistinîkirina gund kir. Gundî jî pir kewxweş bibûn. Me kar û xebatê xwe li wî gund serkeftin derbaskir.

Nîştîman Sorxwin



AYA ANWAR

— Lêkolînerê Siyaseta Afrîkayê ye —

Min Şoreşa Rojava ji rêhevalekî xwe ku li ser malperên sanal medya parve kir agahî girt. Piştra min li ser Şoreşa Rojava hin zêdetir lekolîn kir, di nava wenê, dîmen û nûçeyên agahiyan girt. Her wiha bi beşdarbûna min a li Konferansa Ciwanên Rohhilata Navîn ya ku li meha Heziranê de li Beyrûtê hat lîdarxistin çêbû. Min gelek hevalan dît û bi wana re jî min li ser vê şoreşa mezin axivî.

Tiştê ku di Şoreşa Rojava de herî zêde bala min kişand rola pêşengiya jin bû, di şoreşa de berpirsariya jin di biryargirtin û birêvebirina civakê de tiştêkî ku vê projeyê cuda dike û asta pêşketina wê nişan dide. Ji bilî vê jî gelê Kurd têkoşîn û berwedaniyek bêhempa li hemberî zehmetiyên heyî dide meşandin. Li ser bingeha hevkarî û hevgerîyê civakê demokratîk hewil didin ava bikin. Di aynî demê de gelê Rojava li dijî rêxistina terorîst DAÎŞ têkoşîn kir û parastina gelê Rojava kir.

Lê dema ez niha rewşa heyî dişopînim xemgin dibim, ji ber ku pêşeroja vê şoreşê di xeterî de dibînim. Ji ber ku Şoreşa Rojava bi gelek zehmetiyên ku ji aliyê hêzên emperyalîst tîn avakirin rû bi rû dimîne, di serî de jî êrîşên dewleta tirk a faşist. Ji aliyekî din jî ev êrîşên çeteyên û metirsiyên dervê bandorek neyînî li ser sivilan ava bike. Tevî vê yekê jî heta ku li Rojava gelên tekoşer ku li berxwe bidin hebe û bi projeyek bi metodolojiyêkê xurt weke projeya Netewa Demokratîk ve girêdayî bin, heviyek xurt ê her tim hebe. Şoreşa Rojava bi sîstema xwe ya xweser yanî xweseriya demokratîk, çavkaniya îlhamê ya gelên Rohhilata Navîn û Bakurê Afrîkayê ku ji rejimen otorîter ên li heremê serdestin re modelek alternatîf pêşkes kir û destnişan kir ku demokrasî ne tenê dirûşmeyer e, sistemekê ku dikare were sepandin û serkeftina xwe bi ezmûna rêveberiyê îspat kiriye.

Rojava bi sîstemekê demokratîk a rasterast ku di ware biryargirtinê de ji desthilatê zêdetir dide welatiyan, ev yek jî bo welatên ku zêdetir li beşdariya gel digerin modelek rast û dibe modelek a ku rola pêşengiya jin li Rohhilata Navîn tê da dihewîne. Raste li ser jin her tim zext û zordarî



Serûn Dawê


— Xwendekarê li Bakûr û Rojhilatê
Sûriyê —

Şoreş ev guhertina ji kok a rewşenbirî, siyasî û aborî ya civakê ye û ya ku ji holê tê rakirin rejimên netewperest, otorîter û zordar e. Şoreş avakirina edalet û wekhevî ye, bidestxistina demokrasîya ku gel tê de xwe bi rêve dibe. Şoreşa Rojava li Bakur-Rojhilatê Sûriyê şoreşekê rastiyê ye û îradeya gel a bidestxistina azadiya xwe temsîl dike. Di nava xwe de hemû pêkhatyên gel, ol û çandên Rojava dihewîne. Her wiha Şoreşa Rojava û Bakurê Rojhilatê Sûriyê Şoreşa Jinên Azad e ku ji destpêka şoreşê ve bi hemû hêza xwe têdikoşin û beşdar bûne. Şoreşeke ku ji bo avakirina civakeke demokratîk a li ser esasê edalet û wekhevîyê banga azadiya jinê dike. Jin di hemû qadên siyasî, leşkerî û aborî de cih girt û jin cihê xwe di nava şoreşê de girt. Jin di têkoşîn û tevlêbûnê de xwedî roleke mezin û bi bandor in, ji bo azadiya

xwe û azadiya civakê, ev şoreş weke şoreşa jinê ya li dijî sîstem û desthilatdariyê hate binavkirin. Berxwedaneke mezin hat kirin ku dîrok bi xwîna şehîdan hat nivîsandin mînak gelek in, Arîn Mîrkan, Hevrîn Xelef û gelek azadîxwaz û aşîxwazên in. Ruhê berxwedan û serhildanê yê ku Rêbertî li Rojava çandibû, bû bingeha pergala parastinê û serkeftinê leşkerî yê ku hatin bidestxistin. Ji bo ciwan û jinên ciwan ku di nava refên Yekîneyên Parastina Gel (YPG) û Yekîneyên Parastina Jin (YPJ) de bi ruhê gerîlatî tevî refên refên şer bûne, Rêber APO bûye çavkaniya hêz û moralê bingehîn. Û bêyî dudilî ji bo parastina gelê xwe û herêma xwe bixebitin, Ji ber ku Şoreşa Rojava xwe dispêre fikir û ramanên Rêbertî, gel û pêkhatyên din ên Sûriyeyê bi Şoreşa Rojava re dijminatî nekirin, berovajî vê yekê qebûl kirin û dîtin ku Şoreşa Rojava şoreşa hemûyan e.

DERGÛŞA NETEWA DEMOKRATÎK

Bajarê Til Berak - Nagar



Til Berak yek ji bajarên herî kevin li Bakûr û Rojhilatê Sûriyê ye. Di heman demê de jî yek ji bajarên herî kevn ên cîhanê ye ku tê zanîn. Li derdora sala 5000'î BZ'yê Til Berak bi 4000 şênîyên xwe, yek ji bajarên herî mezin ê cîhanê bû. 6500 BZ bajarê Til Berak tê avakirin û yek ji cihên kevinar e ku tê de çanda Til Xelef zindî bû.

Wekê bajar giredayê kantona Heskê ya herêma Cizirê ye û nêzî cema Xabûrê ye. Navê eslî yê bajêr tam nayê zanîn. Piştî sala 2500 BZ Til Beraq di bin navê "Nagar" an jî "Nawar" tê nasîn. Ev navê jî çanda semîtîk tê û tê wateya "cîhê çandiniyê".

17 Daneyên arkeolojîk û lewheyên Til Berakê yên kevnar nîşan didin ku jyan, civakîbûn û bajarvanî li vir jî bi şoreşa çandinî, hilberîna seramîk, avakirina avahiyên mezin ên îbadet û merasîman, kargerî û bazirganiyê bi pêş ketine. Til Berak bûbû rawestgehek ji bo kerwanên ku bazirganî û danûstandin di nava navendên çanda Til Xelefê li Bakurê Sûriyê de bi pêş xistine.

Di demên berî de, Til Berak bajarek navneteweyî hate hesabandin. Ew di nav sedsalan de mala çend şaristaniyan bû, di nav

Dîrok

de Sumerî, Babîlonî, Akadî û Mîttaniyan. Gelek gel, netew û bawerî lir vir di wextên cuda cuda de an jî di heman wextê de bi hevdû re jîyan kirin.

Ji ber cihê vê ya nezî çema Xabûrê, di heman demê de jî ji ber ku li ser xeta bazirganiyê di navbera Rojava û Rojhilatê Mesopotamiyê ye, Til Berak zû de dibe navendekê giring a bazirganiyê. Di bajar de çûn û hatin pir dibe. Gelek çandên cûr bi cûr bandor li jiyana xelkê bajar dikin. Ev dihêle ku Til Berak di wextên xwe yê zêrîn de xwe bi gelek rengan dixemilîne.



Perestgeha Çavan

Yek ji cihên nav û deng ên Til Berak cihekê pîroz a xwedawenda ye. Jêre dibejin Perestgeha Çavan. Gelek lêkolînvan ji hemû deverên cihanê berê xwe dabûn vederê ji bo li ser vê perestgehê lêkolînin xwe bikin.

Ji ber ku di vê cihê de figurên biçûk bi çavanên mezin hatin dîtin navê vê dibe Perestgeha Çavan. Ev figur ji kevir hatin çêkirin û dema lêkolînkirina dîroka Til beraq û kolandina cihê dîrokî bi sedan figurên wisa derdikevin. Li gorî nêrînên dîroknasên tê gotin ku ev figur wekê diyarî hatin fikrandin. Ji ber ku di çanda Mezopotamiyayê de çavên ji bo parastinê wekê tiştê baş tînin dîtin însan wekê diyarî ji hevdû re didan. Tê fikrandin ev figur wekê diyarî ji xwedawendan jî hatin dayîn, ji ber vê jî ewqas figurên wisa di perestgehekê de hatin dîtin.

Heya niha nehat zanîn ev perestgeh ji bo kîjan xwedawend bû ama belkî ji bo xwedawenda Innana an Îştârê hatiye veqetandin, ji ber bu çav di heman demê de jî temsîla xwedawendên jin dikin.

Dema em di nava dîroka welatê xwe de digerin em dikarin gelek minakên pêkanîna civakê netewa demokratîk bibînin. Civakên ku gelek bawerî û netew li gelek hevdû jîyan dikarin û bi temamkirina hevdû jiyana wan dewlemendtir dibû. Til Berak heyra niha jî bajarekê ku bi welatpareziya xwe û gîredanbûna xwe bi axa xwe tê nasîn. Ji netewên ereb, kurd, suriyayî û hwd. Gel vederê diji. Niha jî di nava pergala demokratîk de xwe rêxistin dikin.



EM DI NAVA DESTANEKÊ DE DIJÎN

Di berxwedana xwe de şervanên leheng ên QSD-YPJ bi awayekî fedaiyane, tevahî erîşên çeteyên dewleta Tirk a dagirker şikandin. Berxwedana Bendava Tişrînê di 8'ê Kanûna 2024'an de destpêkir.

Şervanên berxweder ên li Tişrînê tevahî erîşkarî û gefên ku li ser Bendavê hebûn têkbirin û çeteyên dagirker vala derxistin. Her ku erîşên çeteyan li ser Bendavê zêde dibin ezmûn û performans şervanan li ser şêwazê şerê tunel, şerê bajar, şerê deşt û bi droneyên fedaî yên QSD'ê, şerê hewayî zêdetir dibin. Bi vê şerê berxwedanê ve şervanên Bendava Tişrînê, ji tevahî Bakur-Rojhilatê Sûriyeyê re dibe îlhameke nû.

Em di her keliyê de berxwedan wan lehengan dişopînin, dema hevalên me şehîd dibin li ser meşa wan a dawî bi wan re ne û wan oxirî axa me ya pîroz dikin. Gelek ji wan hevalên me bûn, mirovên me bûn, xwişk û bira an jî dayîk û bavên me bûn. Edî xwîna me bi vê berxwedanê bû yek. Me fêhm kir ku ji xeynî berxwedanê û parastina xwe tiştêkê me nîne. Ne Amerîka, ne Îsarelê, ne jî ti dewletekê din parastina me dike. Li ser me diaxavin, bazirganiyê dikin lê dema

"Bi vê şerê berxwedanê ve şervanên Bendava Tişrînê ji tevahî Bakur-Rojhilata Sûriyeyê re dibe îlhamekê nû"

Destan

mijar dibe maf û hebûn me hemû li hemberî me dibin yek. Di dîrokê de ev dewlet ticar nebûn hevalên me. Amerîka û Îsraêlê Serokê me girtin. Hemû tiştên ku me niha qezenc kir, me bi ked û xwîna şehîdan qezenc kir. Me bi xwe kir. Ji ber vê emê niha jî parastina xwe bi xwe bikin.

*“Lê heta dawî gerîlayên
azadiyê berxwe dan
û destanan dirokî
nivîsandin”*



Şerê Berxwedana ‘ZENDÛRA’ Li Tîşrînê

